

HIŞYARÎ!

Polisên Ewropayê 13 û 26'ê vê mehê li dijî kesên bêkaxiz operasyonan li dar dixe!

Polisên Ewropayê 13 û 26'ê vê mehê li dijî kesên bêkaxiz operasyonan li dar dixe! Yekitiya Ewropayê, bi 18 hezar polisan, li dijî penaber û xerîbên ku kaxizên wan tune , operasyoneke mezin li dar dixe.

Polisan, wê li her derê Ewropayê, di metro, gara trênan, aeroport, kuçe, ser rê û sinoran de bikeve pey kesên bêkaxiz. Bi van operasyonan dixwazin, heta ji destê wan bê, kesên bêkaxiz bigrin û paş ve bişînin. Her wiha, dixwazin rê û qanaleen ku penaberan bikar tînin, tesbît bikin û bi vê ewayî hatina penaberan asteng bikin.

Divê, ji îro pê ve, em zû xeberê bidin wan kesên ku li vir bêkaxiz in û kesên ku dixwazin werin Ewropayê. Divê em wan hişyar bikin.

Em dikarin çi bikin ?

Wexta ku em şahidê kontrolekê bûn, em dikarin astengî derxin. Dîsa em dikarin bala mirovan bikişînin ser kontrolê û bi vî ewayê, em ê nehêlin ku polis bi rehetî tevbigerin. Em dikarin kesên bêkaxiz hişyar bikin û alîkariya wan bikin ku ew bikaribin birevin û xwe xilas bikin.

Dema kontrolê, em dikarin li şûna kontrolê li cem kesên bêkaxiz bisekinin uu nerazibûna xwe nîşanî polisan bidin. Ji bo ku ev operasyon bisernekevin, divê çî ji destê me bê, em bikin. Li dijî van siyasetên dewletan ku nahêlin mirov bi ewayekî azad bigerin û bijîn, divê em alîkariya hev u din bikin.

**Em dibejin "NA" ji bo
hemû sînor, dewlet û
dersînorkirinan re!**

